Gulek ji zozana meleyê Cezrî

Newaya mutrib û çengê
fîxan avête xerçengê
were saqî heta kengê
neşûyin dil ji vê jengê

Heyata dil meya baqî
binoşîn da bi muştaqî
ela ya eyyûhes saqî
edir ke'sen we-nawilha

Ko katib dêmî cedwel kit
şikeste xet muselsel kit
ji yek herfan mufessel kit
kî ye yê muşkilê hel kit

Dizanî rûd û ûd ewwel

çi tavêtin sirûd ewwel
ki işq asan nimûd ewwel
welê uftadi muşkilha

Ji mihra wê şefeq se‘dê
şirîn le'lê şeker we'dê
dinalim şubhetê re'dê
ecîb im lê ji vê ce'dê

Ki dil ra tabi herçîneş
bi kufrê mîbered dîneş
zî tabî ce‘di muşkînеş
Çi xûn uftadi der dilha

Di vê taqê di vê xanê
me eyş û êminî kanê
kesê dest dit ji dewranê
nihalik vê gulistanê

Der axûşeş çû meyared
ki ez dil caneş buspared
ceres firyadi mêdared
ki ber bendîdî mehmilha

Bi Qur’anê bi ayatê
eger pîrê xerabatê
bebêjit secde bin latê
murîdên wî dibin qatê

Murîd er bê beser nebwed
zi fermaneş bider nebwed
ki salik bêxeber nebwed
zi resm û rahi menzilha

Şevê zulmat û deryayê
ji mewcan qet xeber nayê
şikestî keştiya bayê

ecacê wê şefeq dayê

Ji herfan mah û sali ma
nehat der şiklî falî ma
kuca danendî halî ma
sibikbaranî sahilha

Me ra ji ewwel çi bir xamî
kişand axir bi bednamî
ji rengê Se'dî û Camî
ji şuhret pê hisîn 'amî

Bi deng û bang û awazê
dibêjit nexmeya sazê
nihan key manedan razê
kez û sazendi mehfilha

Ji Hafiz qutbê şîrazî
mela fehm er bikî razî
bi awazê ney û sazî
bibî ber çerxê perwazî

Tuzed min hubbihe s-sefwa
bihi ehlu l-hewa neşwa
meta ma telqe men tehwa
de'i d-dunya we-ehmilha